

© Beate Frenzel, Gülşah Mavruk (2018)

Rênimûna hevpeyvînê jibo hevpeyvîna bi xwendekarên ku teze koçber bûne

Şiroveyek li ser belgeya rapirsînê

(Kurmandschi – Übersetzung durch externen Anbieter)

Belgeya rapirsîna li ber dest wek rênimûna hevpeyvînê û zanyariyên bingehîn bona danûstandina navbera hevkarên mamoste ku hevpeyvînên wergirtinê digel zarok û nûciwanên teze koçberbûyî pêk tînin, hatine amadekirin.

Têkildarî van hevpeyvînên wergirtinê divê were berçavgirtinê ku ev hevpeyvîn tenê bi armanca diyarkirina nêrîna sereke an terxankirina komên fêrbûnê ye û îmkana çareserkirina lezgîn a hemî mijarên berçav têkildarî birêxistinkirina dibistanan tune. Ev sînordarî bi taybet têkildarî warin weke malbat, koçberî û rewşa mayînê ye ku hûrbûna li ser wan renga bibe sedema bibîrxistina berbîhurî li xwendekarên ku tûşî şokebûn û behicînê bûne. Elbete mijarên dabînkirina malî jî ku jibo daxawza polên xurtkirina fêrbûnê û BuT-Maßnahme (kiryarên perwerdehî û beşdarbûnê) girîng in, divê demekê da bînin hilkolandinê ku ji pêş va îmkana pêkanîna têkiliya li gorî pêbaweriyê di navbera mamoste, xwendekar, dêbav, sergêr an qewûm û alîkarên dibistanê hatibin dabînkirin.

Yekayekê babetên belgeya rapirsînê divê li gorî temen û zanyarî û agahiyên xwendekarên pêşerojê bînin sazîkirin. Her mijar û babetek bo her zarok û nûciwanî guncan nîne. Biryardana li vî warî da li ser esasa nîrxandina mamosteyên wergir e.

Belgeya rapirsînê hin îde û fikrên sereke yê diyarkirina armanca amade dike. Li ser vê esasê divê tevahiya çavkaniyên zimanî yê xwendekaran bîn tomarkin. Li Pişka 3 (Tecrubeya zimanî li welatê sereke) divê biakranîna zimanî ya taybet were tayînkirin. Bi vê mebestê em dikarin tevahiya hostetî û pisportiyên biçûk (Axaftin, xwendin, nivîsîn û bihîstinê) berçav bigirin.

Jibo kemilandina vê belgeya rapirsînê tecrubeyên pêşîn ên xwendin û şolî, meyl û meraq û şiyane zarok û nûciwanên tze koçberbûyî bi zimanên sereke yê cûrbicûr tîn pirsîn. Ev kara îmkana terxankirina komên fêrbûnê pêk tîne ku ne tenê li gorî rewşa niha ya zanistên zimanî, belkî her wiha li gorî xwestek û şiyana ne-pratikî ya kesên têkildar e.

Bawernameyên hitmalî yê xwendinê yê heyî ji welatên sereke rene li dewleta herêmî ya Kolnê va ji hêla piştrastkirina ihtimalî ya bawernameya dibistanê heta xwendengeha navîn bîn hilkolandinê.

(http://www.bezreg-koeln.nrw.de/brk_internet/leistungen/abteilung04/48/erkennung/auslaendische_schulzeugnisse/index.html)

li aliyên din jibo piştrastkirina dîplomaya dewleta herêmî ya Dûsêldorfê berpirs e.

(http://www.brd.nrw.de/schule/schulrecht_schulverwaltung/Zeugnisanerkennung.html)

Tu dikarî listeya çavkaniyên behskirî li ser hevrê digel pirtûka fêrbûnê û nivîsên tekmîlî jibo fêrkirinê hevrê digel xwendekarên nûkoçkirî bi awayê lînk li malpera ProDaZ-
<https://www.uni-due.de/prodaz/bibînî>.